infoasaid

**Lîsteya Kontrolê ya ji bo Amadeyîtî û Bertekkirinê di Rewşên Awarte de**

# DANÛSTANDIN

## Amadeyîtî

1) Civaka xwe û awayê jiyana wan tev bawerî û çalakiyên çandî, astên perwerdehiyê, zimanên ku pê diaxivin û adetên wan di bikaranîna medyayê de nas bike û hay jê hebe.
2) Hevkarên xwe yên di warê danûstandinê de nas bike. Ji nav wan ve dibe ku van ên hanê hebin: rêberên olî û civakî, xebatgeha taybet, rêxistinên civakî, dibistan, medyaya herêmî, rêxistinên nehikûmetî û civat bi xwe.
3) Hem medyaya xwe û hem jî têkiliyên xwe nas bike
4) Di dema amadekirinê de, heke guncav û pêwîst be, li ser qadên sereke yên wekî pêşvebirina paqijiyê (WASH), haydarî ji mînan (Parastin), Tenduristî û Xwirak peyam û materyalan amade bike.
5) Ji bo nasîna gef û tehdîdan bike civak bibin beşdarên xebata te û peyamên guncav amade bike û piştre û berî hertiştî wan bi komên cuda yên civakê bide ezmûnkirin û cudahiyên zayendî, gundî/bajarî, di astên perwerdehiyê de û di temenê beşdaran de li ber çavên xwe bigire da ku têgihîştin ji sedî sed bê pêkanîn.
6) Hevpîşeyên xwe yên di warê danûstandinê û gihandina peymanan de perwerde û rahênan bike
7) Bi civakê re sazgêriyên paşragihandinê saz bike

## Bertek

1) Komên te yên 'ku di bin metirsiyê de ne' kî ne?
2) "Girse û cemawerê armanckirî" yê te kî ye?
3) Tê çawa xwe bigihînî wan? Dem û cih li ber çavên xwe bigire
4) Kîjan rêyên pêbawer ên danûstandinê baş dixebitin û berdest in?
5) Divê gelheyên bandorkirî çi bizanibin? (li ser bela û karesatê, çawaniya xwe-dûrxistina ji talûkeyan, lixwemiqatebûn û desttêwerdana plankirî)
6) Tu çi dixwazî ji civakên bandorkirî re li ser bernameyên xwe bibêjî?
7) Ma sazgêriyên paşragihandinê hene?
8) Ji bo pêşvexistina danûstendina agahiyan kîjan sazgêriyên din dibe werin bicihanîn?
9) Tê çawa materiyal û amûrên danûstandinê peyda bikî?
10) Tê çawa materiyal û amûrên danûstandinê çavdêrî bikî û binirxînî?